

Rêzdar Xelîlê Heso, berketiyê Êzdîtiyê û evîndarê welat bû !

Dema min jî bihîst ku rêzdar Xelîlê Heso di 04.05.2010 de kirasguhastiyê, ez pir xemgîn bûm û ez di nav mitalan de çûme nav wan rojên ku min rahmetî di sala 1970 de li nav bajarokê Qubîn(Bişêriy)ê de naskir. Baş tê bîra min, gava Xwedê jê raziyê Xelîlê Heso me çend xortên xwandevanên Êzdî li nava Qubînê didît, ew gelekî ber dilê me diket û şîretên pir baş li me dikirin.

Ji xwe min di nav bîranînên û di rûpelên pirtûka xwe(*1) de, ji ber zargotina şadeyekî ku rewş û berxwedên malbata rêzdar Xelîlê Heso(Halil Tagay) baş nas dike weha nivîsandiyê: ”.. di wextekî de gelek mal û milk(erd)ê van herdû birayên Êzdî di gundê Qorixê de hebû. Me merivên wan jî hingê alîkarî dida hevûdinê û me gundiyan(hingê em çil malên Êzdî, sê malên xaçparêz û çend malên musulmanan tevî şêxekî wanî bi navûdeng di gundê Qorixê de dijiyan) jî bi xêra çandinya erd-debara wan xwe xwedîdikir.

Evan herdû bira Xelîl û Usiv di sala 1981 de Qoperetîfa çêlekên şîr didên vekirin. Ji xwe di wî wextî de piraniya Kurdên di herêma me de nizanîbun ka Qoperetîf çiyê. Wexta qoperetîf vekirin û 50 çêlek(mang)ên şîr didan anîn, çend jî me karkerên gundivên xwe jî ji bona xwedîkirina mangan û hilanîn-danîna şîr di nava şuxlê qoperetîfê de dane şuxlandin. Dûre jî bo karibin karûbarên qoperetîfê çêtir nasbikin û şuxlê xwe hînjî bi zanistî birêve bivin, rabûn çar ji ciwanên me(ev şexsan hêjî saxin û ez dikarim navên wan jî eşkere bikim.Lê..) gundiyan şandine dibistana ji bo zanîna karê qoperetîfê. Gundiyan jî didîtin ku ev nikaren hemû karkerên li gund(Qorixê) hene tevan di qoperetîfê de bidine şuxulandin. Hinek ji gundiyan me yê betal ku ji ber zilm û zora dîmî nikaribûn ji gundê xwe derkevin jî çûn xwe avîtine ber bextên van biran û gotine wan: “hukumet û alî we nasdikin, gava hûn bixazin hûn dikarin me di ciyekî dinê de bidine şuxulandin”. Birastî jî, hukumeta hingê gelekî kêfa xwe ji van herdû birayan re tianî. Bixêra wan dahin û standinên wane baş, rabûn hingê 10 kesên gundiyan xwe ji bo kar şandine derveyî welat. Belê, vane hinek ji van deh kesan vêga hêjî li Almaniya û Feransa kardikin. Gelek merivên li derûdora Bişêrî yê û ne Êzdî jî dizanin, van birayên Êzdî hingê çûne nava Tirkiyê ji herêma Çukurova çar barên gamiyonan ji zeyt, margarînê û hwd.ê anîn bi nivbuhayekî li gelê herêma xwe belakirin(Bi Xwedê, vêga hêjî gelek kesan ew perên deynên xwe ye hingê nedane van biran).

Ji xwe heta ku xwediyê fabrîqa şîr ya li bajarê Sêrtê nizanîbû ku ev herdû birayên xwediyê qoperetîfa gundê Qorixê Êzdîne, ewî şîrê jî qoperetîfa wan dihat tev bi dilxweşî dikirî. Dema hinek kevneperest û olperestên li derdora Bişêrî û Batmanê dîtin ku va rewşa van herdû birayên Êzdî ji ya wan gelekî baştir dibe û yê bi wan re dişuxulên jî gelekî pêşdikeve. Ew radibin diçine cem xwediyê fabrîqa şîr ya li bajarê Sêrtê re dibêjin, “ev berhemên fabrîqa te, ji şîrê ku Êzdî tînin didine te çêdibin û hûn jî dizanin keda ji ber destên Êzdiyan dertê herame. Emê ji gelê musulmanî li derûdora xwe re jî bêjin, bila kes hew berhemên fabrîqa te bikire....” Ji ber vê gotegota xêrnexwazên Êzdiyatîyê, încar xwediyê fabrîqa şîr ya li bajarê Sêrtê jî kirîna şîrê qoperetîfa gundê Qorixê da rawestandin. Dûre me şîrê jî qoperetîfê derdiket dibir dida hinek karbidestên(weke nanvan, pastecî û yê) ku di nava bajarê Batmanê de berhemên xwarin û vexwarina ji şîr çêdikirin û difirotin. Paşê gava ev kerbidest jî pê hesiyan ku em Êzdîne, ewan jî êdî hew şîrê me kirîn.Heta hinekan jî wan jî gelek tiştên ne baş anîne serê me....

Vêca, Xelîl û Usiv ji vê rewşa nebaş fahmkirin û rabûn ji mecbûrbî çêlekên xwe yen qoperetîfê firotin. Dûre fikirîn û dizanîbûn ku di herêma me de qet fabrîqên arvan tûne ne. Rabûn încar di sala 1987 de dest bi vekirina fabrîqa arvan kirin. Dema karê fabrîqa arvan xelasbû û fabrîqê dest bikarkir, hingê dîsa sed karkerên li gund û di herêma gundê Qorixê de di karê nava fabrîqê de karkirin û ewan jî bixêra vî karê nava fabrîqê de aboriya nava mala xwe gelekî serrerast kirin. Weha qezenc-kara gelek cotkarên ku zadê xwe încar ne

dibirine deverên dût jî zêde bû. Ji xwe hîna gelek cotkaran nizanîbûn ka wê di dawiya debara wan de çiqas dexil-zadê didestên wan de bimîne, dihatin hêja hingê bi sedhezaran qirêdî ji van herdû birayên Êzdî yên xwediyê fabrîqa arvan distandin. Ji xwe gelek axa û cotkaran hêjî ev deynên qirêdiya hingê standine ne dane wan. Di van salên dawî de hinek ji wan deyndarên xayîn dizanîbûn ku tû kesê Êzdî zêde li deodora herdû bira nemane. Heta ji bo ku hinek ji wan deynên qirêdiya standî nedin, rabûn încar fesadî, nakokî û dijberî xistine nava gelê herêmê û gotin:” Em nanê ji arvanê li ber destê Êzdiyan dertê naxwin, divê musulman genim(zad)ê xwe nedine Fabriqa Êzdiyan, Nanê musulmanên di vê fabrîqa Êzdiyan de kar diken jî ne helale, keda musulmanên ku di fabrîqa Êzdiyan de karbike herame, bila ev herdû birayên Êzdî jî herin bigihîjine wan merivên xwe yên ku çûne di nava gawiran de li dijî me û hukumeta me propaganda dikin.....,.... ûhwd.”

Încar ji ber vê zilmê, gotegota van zordar û kevneperestan wan karkerên musulman yên ku di nava fabrîqê de kardikirin jî dev ji karê fabrîqê berdan. Weha herdû bira mecbûrdibun herin hinek karkeran ji herêm ne dinê bînin. Ez baş dizanim ji xwe gelek deyndarên musulman jî deynen xwe înkarkirin û deynen herdû biran nedane wan. Wekî dinê jî min di wî wextî de gelek caran bi çavên xwe didît, dema ku axa û musulmanên li gundê derûdora Qorixê diman camî yek di gundê xwe de avadikirin û pêwîstiya wan bi pera hebûn, dihatine cem Xelîl û Usivê Êzdî lave-lava alîkariya madî li wan dikirin. Xelîl û Usiv jî hêja hingê bi deh hezaran lîre alîkarî didane wan. Na, wexta ji axa, melle û hevalbendên wan re pere pêwîstbûn, ewan hingê ne digotin, em perê alîkariya we Êzdiyan naxine nava ya xêra musulmanan. Vêca, piştaka olperest û kevneperestan her wextî ji dewletê jî heye. Ev îro baş dizanin ku piştaka Xelîl û Usivê Êzdî ji kesî nemayehe. Ji xwe gelek kes jî dibîne û dizanen ku em Êzdî jî ji ber vê zilm û zora di herêma me de reviyane hatine derveyê welat. ...”

Wekî dinê jî, ez baş dizanim ku rêzdar **Xelîlê Heso**, li bakurê kurdistanê ji bo azadiya me Êzdiyan û evîna welat gelekî xizmet kiriye.

Bila rahma Xwedê li rêzdar Xelîlê Heso be !

Sersaxiyê û sebrê ji hemû nefêrên malbat, dost û pismamên wî ra dixwazim.

Kemal Tolan

07.05.10

Çavkanî*:

1 Kemal Tolan -Nasandina Kevneşopên Êzdiyatîyê, rûpel :399-402. Weşanên Perî-Çileyêpêşîn 2006 Stenbol.

2 Şade, kesekî ji gundê Qorixê ye û belkî piraniya we xwande vanên birêz jî wî baş nas dikin.